# DEMA NIHA

## Ordiya Frensizî a Nû

### 530.000 ESKER BI ÇEK Û POSATÊN NÛ

LONDRE— Nihû 530.000 eskerên frensiz, ji bona şerî hazirkirî li ber dest in. Destê wan de silehên emerîkanî ên nû û nûjen hene.

LONDRE— Wezareta Brîtanî a hewayî dide zanîn: Şevêçûyî refine brîtanî ên xurt ji bombeavêjên Lankester bihevketî bi ser axa Germanistanê de girtine û li Berlînê xistine. Hezar û pênc sed ton bombe hatine avêtin hêjagehên payetextê Reyxê. 30 balafir venegeriyane warên xwe.

Moskû— Rojnama rûsî Krasnaya Zvezda bendên nivîsevanê rûsî ê mezin Ilya Ehrenbûrg ser Frenşê belav dike, nivisevan di nivîsarên xwe de qala welatperwerên frensiz dike yên ko bi confidariyeke mezin di riya welatê xwe de berberiya elemana dikin.

Londre— Ordiya Yugoslavî ya ko şerê elemana dike ji du sed hezar şerevaniyan bihevketî ye.

Tehran— Gava Mr. Çorçil ji Stalîn xatir xwest destê wî giwaştiye û jê re gotiye: bi xatirê te Mareşal Stalîn, Xwedê te bihêle

QAHIRE— Sefîrê Sovyetistanê li Qahirê M. Novîkov yê ko nimînendeyê Sovyetistanê ye li ba Hikûmeta Yugoslavî duhî namedanîna xwe pêşkeşî Kral Pier kiriye:

LONDRE— Di Savua Jorîn de welatperwerên frensiz 79 hitlerî kuştine.

MOSKÛ— Dr. Benes serekcimhûrê Çekoslovakyayê gihaye Moskovayê,

MOSKÛ— Ordiya Sor ji her du aliyan zora xwe dide rêhesina ko di Dniepra jêrîn de ye, ev rêhesin ji bona elemana pirsa heyîn an nemayînê ye. Leşkerên rûsî yên ko di Krivoy—Rogê de, li xeta Dniepropetrovskê derbaz bûne zor didin Znamenkayê; û wilo dixuye ko ketina vî bajarî destê Ordiya Sor ne dûr e. Rojnama rûsî «Kraznaya Zvezda» dibêje: li nîro-roavayê Gomelê, di navbira Dniepr û Beresinayê de, der axa Pripetê, enişka Dnieprê a mezin de û li nîroyê Kremençûgê û li cihên eniya rûsî a mezin î din de Ordiya Sor zora elemana biriye û ew xwe bi şûnda dikişînin û bi şûn xwe ve bi hezaran kuştî û brîndar û çek û posatan dihêlin. Cehda Serdariya elemanî tu kar na de, û eniya şerî ber bi roavayî ve paş ve diherike. Di khergirava Kerçê de ji bona firehkirina rê û dorên serpirên danî qomandine zexim çêdibin. Di roavayê Kremenzçugê de Ordiya Sor xwe dilezlizine û ber bi bajarê Novo Georgievê ve tê, Eleman ji bêwextiyê nikarî bûn, vî şaristanî xira bikin.

**Strana Kurdî**

## DELALÊ QEREJ - DAXÊ

Were delal beriya mila beryake dûze, pozê kêl û Mamdellê bi ser da mêl û xûz e;

Sala çûnî vî çaxa, ramîsanê bejna zirav li cem min mift û belaş bûn, sala îsal ji bextê mi ra bûye zêrê alî dûz e.

Were delal dilê mi kele kelî... Birek karê Xezala hilkişiyane pozê cûrê, ebû Şexatê xopan, pozê Tugêl hilkişyane fêzan û mexel e.
Ez li bejna xelkê delal dinêrim, nava şên yê me şewitî, nala meşa qitikê fesala Xezalê kêsima kewa gozel e.

Were delal, mi li diyara li diyarê qolî babê, vê sê li odeka bavê Meysê, tê dengê pêxwasa, welî nê lawê bava, qîrîna goştê kebabê

Ez terka bejna zirav, xelkê têlî nakim, hetanî xwê şîn ne be, qantir nezê, gawur najo ser Îslamê.
Were delal ez bi pozê Mamdella şewitî ketim, berfê lê kir.

Were delal, mi dî Xezal meşiya, karê li pê, çîxir çêkir wexta lawkê mi çû welatê Xerîb û xurbetê;

Ez nizanim, tê di pê xwe ra, temya mi kara xezala li kê kir.

Were delal, mala delalê dilê mi, dike bar ke, mi go: gundîno, malîno, rihsipîno; ji bo xwedê be, destê mi bi heval ke, sûnda qesem li bedena mi be.

Hûn destê mi ne kin heval, ezê xwe, li şûna warê delalê dilê xwe, di axa sar kim.

Were delal, mi li diyara li diyarê ax wêranê, mi dî berfê da bû ser baranê, mi ji Wêran şara şewitî hetanî mîrata til Goranê;

Xwedêwo, tu mirazê heval û kardaşa gişan bike, bira bibe mi radê min û xelkê delal, her çar rokê remezanê.

Were delal, were delal bira xwezî tim û tim, havîn ba, bira cîyê min û bejna zirav;

Qerej Daxa şewitî, Mêrgemîra jorîn ba, bira ciyê raxa me erd ba, ser axa me ebaka delêl şalîn ba, bira pirêzkê berfê, zîpikê bihata bi du weqîya.

Were delal, mi li diyara, li diyarê Tewrêzê, pezê bavê Nezîr, li textê Mamdelê ketiye, şîs û rêzê, ez terka xelkê delal nakim, hetanî Îslam najo ser Parêzê.

Were delal, bi Qerej Daxa şewitî ketim, lawika bi herem e, mi ji Mêrgemîra şewitî hetanî bi kura eceme, ez ne xweş im, lawika tu were ser me.

Were delal kanîya gundê me bi niît e, şarûr û bilbila tê da wîtewît e.

Sala çûnî vî çaxa, ramîsanê bejna zirav, li cem mi belaş bû, sala îsal ji bextê min û te ra bi bişkok û bi kilît e.

Were delal, ez çûm Diyarbekra xopan, orte bi gol e, dor bedenê hatim Qerej daxa şewitî, textê Mamdellê, temam cîw û meqamê min te ne.

Tu were destê xwe di nabêna destê mi ke, emê hev du birevînin, xwe berdin welatê Xerîb û Xurbetê, dawiya me Xazî-Entab e, pêşiya me germiyan û Edene.

EBDILHADÎ MIHEMED


# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞÎTIYÊ

### Xebat - Fidakarî - Serfirazî - Serdestî



Topeke Mezin Penah û Çeperên Neyaran Dide Ber Agirê Xwe,



Refên Hevalbendan Bi Hewa Ketine û Berê Xwe Dane Hêjagehên Neyaran.



Topeke balafirşiken Ezmanan Ji Refên Dijmina Paqij Dike.

www.arsivakurdi.org

# DI PESIFIKÊ DE

## Cengîne Xurt û Zor Dom Dikin

Weşington— Qiwetên emerîkanî direjî giravên Marşalê kirinê, yên ko di Pesifîkêde ne, yekîneyên emerîkanî dertketine wan giravan. Japon didin zanîn ko di bakur rohelatê giravên Marşalê de şerekî behrî û hewayî î xurt dom dike. Du sed balafirên hevalbendan li qerargeheke japonî xistine.

Melburn— Eskerên Ewistralî bi tevkariya tang û topan di xelîça Hu—Onê de Japon şkênandine û ji nû ve pêş ve çûne. Refên hevalbenda waporeke Japonî 6.000 ton mezin bin av kiriye û 155 ton bombe avêtine warên japona yên pozê Glosesterê.

Weşington— Niho di ordiyên emerîkanî de 7.390.000 esker hene, Stola emerîkanî ji 840 waporan bihevketî ye.

QAHIRE— Serekcimhûrê Tirkiyayê Ismet Înonu bi wezîrê dervekariyê ve hatiye Qahirê ji bona dîtina Mr. Rûzwelt û Çorçil. Serekcimhûr Ismet Înonu berî çûye ba Mr. Çorçil û pişt re her du pevre çûne cem Serekcimhûr Rûzwelt. Pirsa ko tête kirin ev e: gelo Tirkiya bi çi awayî dikare biserxwegirtiyên xwe yên ko ji ehda tirk û ingilîzî dertên bîne cih.

WEŞINGTON— Egîdê Stalîngradê Mareşal Voroşîlov wê here Londrê û tevkariya şerdariyên emerîkan—ingilîzî bike, ji bona danîna planên vegirtina erdê Ewripayê. Bi wî awayî êrîşên sovyetî yên hêla rohelatî û ên ingilîz—emerîkanî yên roavayî dê bêne yekaheng kirin.

Nêrevan bawer dikin ko di Tehranê de qala tiştên din gelek hêja jî hatine kirin û di warê diplomasiyê de bûyerine girane çêbibin.

LONDRE — Mareşal Stalîn Mr. Çorçil û Rûzwelt li ser vekirina eniyek e diwemîn û sewemîn bi fimamî li hev hatin e.

STOKHOLM — Von Mansteyin 2.000 tangên Ordiyên xwe bitimamî xistiye şerî bi qesda vegirtina Kievê. Lê niho ew bi balafian esker dişîne eniya Dnieprê ji bona arîkariya qiwetên elemanî yên ko bi ketina Znamenkayê halekî bêhevî de ne. Eleman îro mukir tên ko di axa Çerkasî û Krivoy—Rogê de qiwetên xwe ji nû ve paş ve kişandine.

# LEYIPZIG HATIYE BOMBARDIMAN KIRIN

LONDRE — Wezareta brîtanî a hewayî dide zanîn: Sevêçûyî zehf refên brîtanî ji bombeavêjan bihevketî di ser axa germanistanê re firiyan e. Refên brîtanî pêşî berê xwe dan Berlînê, û bi vi awayî nêçîrvanên dijmina xapandine û piştre bi ser Leyipzigê de girtine û 1500 ton bombeavêtine hêjagehên vî bajarî, pê şewat û teqandinine mezin çêbûne. Leyipzig bajarekî elemanî î mezin e û têr destgeh û febrîqan e

Raporên pêşîn elam didin ko derba cihên xwe girtine û pê xesarine dijwar gihaye vî şaristanî.

## Strana Kurdî

### Ay Lê Gulê

Eman ne man, Eman ne man
Ez heliyam tu di min ne ma !...
Bejna te zirav e
Tak rêhanê li ber avê
Şaq û perê xwe berdane li vê navê
Ez xulama şê biskê te
Sorî hene kirî
Li ser hinarikê rûkê te
Da silavê.
Mi dî sibehê gewra min
Rahişt kûzê xwe çû
Mîrata kehniyê, avê,
Ezê çiqas xiyal û bala xwe didimê
Neqeba cotê zermemika
Serê çeleyê zivistanê
Şil dibûyê, ji avê yê
Ne welen ji xunavê.
Mi dî germa havînê
Li me dên da
Mi dî bihna qûtya gulyaxê
Di ber pişta bejna zirav de
Bihin da...

### STRAN

Şerkî dibû li Kûçê—Bano
li Hesara şewitî
Ji kula dilê mi re bi sê ciya.
Mi dî li ser serê Derwêş begê
Xweş hat hemînê mitralyozan,
Dengê sê payê mîratê çapliya
Gelek şehde û şihudê Derwêş
begê, Mehmûd begê
Gelek hen e...
Ban dikirin peyano, bavê mino
Mêre çê bin, çe bixebitin
Emê mitralyosê dewletê bistînin
Emê eskere dewletê bişkînin
Bila deng here sedareta Stanbolê
Bigerê li hemî ciya.
Mi dî, şerekî dibû li Kûçe—Bano
li Hesara şewitî.
Wa li we ye.....
Mi dî Derwêş begê bi sê dengan
ban dikir
Keko Mehmûd begê
Mi dî xweş hat dengê mîratê
sûstema
Dengê navtêdanê kurê bava
Li ser serê eskerê dewletê ye.

### Erebşênê

Mi dî bejna zirav ji avê tê
Bihna misk û enber û
Darçîna ji ber pistê tê
Mi je te re ne go:
Were bîstkê li tenişta min rûnê
Emê bikin kêf û helakêr
Û naqirdiyê darê Diné
Mirina mala xerab
Bi bîra kê tê...


Bejna te zirav e, takê rêhanê
Şîn dibû li Tizyana şewîtî
Lî pîkê heywanê;
Şan û şîna mala Fendî axa
Li binya malê
Heke qatî ne bû, miradê dila,
Û'wezê bejna zirav birevînim
Emê xwe bavên bext û ocaxê
Bavê Kamil,
Bila sala vê salê, di ber me de bidê
Her sê qistê dêmanê.
Ber derikî mala bavê min
Bî sergo ye.
Kûçîkê Kanos gelekî no ye
Xera dikir civanê hero ye
Mi dî bihar hatî
Çaxê kerengvaniya.

Xwezla mi bi wê gavê, wê saetê
Ko min cihê xwe û bejna zirav
Li banê bilind tevde daniya
Gava mamûrê firara
Bi der ketana nav Omeriya
Minê navê xelkê delal
Ji çîtika ses hilaniya

O, lo kuro...
Derî veke were hinduro
Xwezî bi gava ko serê min û te
Here ser behlîfê, tu bê keçê û
Ez bê kuro
Mi dî bihar hatî dilaxêvê
Payîz hatî çaxê dilketin û kêfê
Kêf û henk xweş in
Li ser xaniya, li bin lihêfê.

# PÊJINÊN DINYAYÊ

## CENG & BIHINGEH



Topeke Giran û Dijwar. Wagonek we [illegible] e û Digihîne Cihê Hewcedariyê.



Ji Destgehên Hevalbêndan Ji Nû Ve Waperek Ketiye Behrê



Sihvanvanên Brîtanî Pê Li Erdê Kirine û Erîşî Dijmina Dikin.

IMPRIMERIE DU JOURNAL LE MI OIRD'ORIENT

www.arsivakurd.org